

TU WEHA DIRANÊN ZAROKÊN XWE DIPARÊZÎ

Kurmîbûn ziyanê li diranên zarokên te dike!

Kurmîbûna diranan (karies) nexweþiyek e; ew bi peydabûna ziyanekê li rûyê diranan dest pê dike. Ew hêdî hêdî qulekê li diranan vedike. Ya herî baþ ku mirov xwe ji kurmîbûna diranan biparêze, ew e ku diranên xwe bi firçeyê li gel krêma diranan ya ko flor tê de heye firçe bike. Mirov dikare her roj bi vê yekê rabe – zanînê daye nasîn, ku tesîra wê gelekî lê heye.

Zarokên biçük hewcedarî alîkariyê ne, ku diranên xwe firçe bikin!

Bi alîkariya zarokên biçük rabe ku ew diranên xwe firçe bikin! Deam ku zarok digihînin sala çûna xwendegahê, hîngê ew dikarin bi xwe bi awayekî rast diranên xwe firçe bikin. Hinek krêma florê bi ser firçeya diranên zarokan de bike û her êvar piþtî þîvê qenc diranên zarokan firçe bike. Piþtî wê; ta ku hemî krêma diranan neçe, bila gelekî zarok avê di devê xwe wer-nede. Ji bona zarokên biçük yên ko nikarin krêma diran jî devê xwe velo bikin, divê mirov bi qasî neynoka tiliya qilîçê ya zarokan hinek krêma dirana bi kar bîne.

Flor çî ye û çawan ew kar dike?

Flor madeyek e, ew li nav suriþtê, herweha di nav ava vexwarinê de jî heye. Di nav piraniya cureyên krêma diranan de flor heye. Flor dirana xurt dike, ku ew karibin bi awayekî baþ xwe li dijî kurmîbûna dirana bigirin.

Ma tiþtekî din heye, ku diran pê bêne parastin?

Herweha giring e jî; ku mirov pir caran hindik hindik nexwe. Pekir û vexwarinê þîrîn di navbera danêñ xwarinê de xetera kurmîbûna diranan bilind dike. Pîreta baþ ew e; ku mirovbihêle zarok hemî pekirê xwe di hefeteyê carekê de bixwe ("lördagsgodis" bi swêdî) û paþê diranên zarok firçe bike. Heye ku piþtî vexwarinê þîrîn baþtir e, ku mirov avê vexwe. Ku mirov ava ku flor tê de heye; di devê xwe werde, ew jî ji bona kesen ku bi qencî diranên xwe firçe nakin;

diranan diparêze. Ji ber ku nabe ava florê bête daqurtandin, divê têwerdana florê bi tenê ji bona zrokêñ hinekî mezintir bête bi karanîn. Herweha dibe jî ku diran bi boyaxa ku flor tê de heye bêne dermankirin. Bijîpkê diranan an paqijkerê (hygienist) diranan bi vê yekê radibe.

Ji ber ci kurmîbûna diranan çê dibe?

Bakteriyêñ ku ji xweberê di dev de hene, ew dikarine þekirê di nav xwarinê de bikine tirþî, ku ew hêdî hêdî ziyanê li diranan bike. Dema ku þekir di dev de kêm be, hîngê raqetandin radiweste û rûyê diranan di ber re digihîne ku xwe ji nû ve ava bike.

Dema ku mirov pir caran bixwe, ev balansa suriþtî di navbera raqetandinê û hêza avakirina diranan de pûc dibe û namîne. Diran di ber re nagihînin ku bi avakirinê piþtî raqetandinê rabin. Ew bi kurmîbûnê dikevin. Firçekirin hinekî ji bakteriyan davêje û flor avakirina diranan jî careke din bilind dike. Ji ber vê firçekirina bi krêma florê diranan diparêze.

Mirov dikare kurmîbûna diranan bibîne?

Kurmîbûn bi sipîbûnê dest pê dike, lekeyêñ xwarinê li rûyê diranan diyar dîbin. Paþê ew leke reþ dîbin. Qulek li diranan vedibe. Bi awayekî ziyan lê dibe, ku laþ nikare wê bi xwe çê bike.

Ma tu dixwazî bêtir zanibî

Encumana wîlâyetê (landsting) ji lénérîna diranên zarok û ciwanan ta 19 saliyê berpirsiyar e û belaþ e. Wek adetî Folktandvårdskliniken (klînîka lénérîna diranên gel) bi lénérîna diranan radibe, lê li piraniya encumanen wîlâyeten zarok dikarin belaþ biçine ser bijîpkêñ diranan yên taybet-mend jî. Ji bijîpkêñ diranan bipirse. Tu dikarî dan û standinê li gel klînîken Folktandvårdê di riya navenda lénérîna zarokan an di riya kataloga telefonê re dayînî. Li www.folktandvarden.se û www.infomedica.se, tu hîngê gelek þîretan digirî ku tu çawan diranên zarokên xw biparêzî.

Têkst: Barbro Ememo, rojnamevana bijîpkî.

Ev têkstê ha li ser raporteke zanisî ji aliye SBU (amadekirina dewletê ji bona nirxandina bijîpkî) ve ava dibe.

Kontrolkirina rastiyen: Susanna Axelsson, bijîpkâ diranan, SBU, û profesor Ingegerd Mejáre, Eastmaninstitutet, Stockholm

Redaktör: Ragnar Levi, bijîpk û serokê agehîdariyê, SBU. Mafê kopîkirinê SBU û Barbro Ememo ye, 2003